

Heta sala 2050'an gûherînê çawa têñ

» RÜPEL 9



Teknoloji

Ji Chan- wook fîlmeke tirsdar!

» RÜPEL



Çand

Versiyona çapkirî ya HAWAR NET.comê / Çapa Dijital / 23.02.2010

Hejmara 5

Rojnameya Kurdî a serbixwe

hawarnet.com / hawar.hk-mg.net/PESKETIN

agahi@hawarnet.com



Gelo ûrân dest bi
çêkirina sîlehêñ
nuklerî kir?

Saziya Navnetweyeyî ya Atomê cara pêşî
ragihand ku ew bi tîrs û gûmanin ku ûrân
dest bi çêkirina çêkên nuklerî kirin e.
rûpel 6

Xeyala DYE'yê li
Polonyayê dibe rastî!

Plana DYE a bi cih kirina fuzyêñ Patriotê
pêk tê. rûpel 7

Dewleta Tirk ji disa amadekariya
operasyoneke berfireh dike » r.2

Rêngê asmanê Herêma Kurdistan
sor bû...» r.2

Kurd li bakûrê Kurdistanê jiyan
rawestandin » r.2

Li Amedê Konferansa Sporê dest pê
dike » r.10

Torêñ sosyal pişta blogan şikand..
rûpela 8

Şaredariyêñ Kurd bo Kurdî berpirsyariyêñ xwe naynin cîh!



Kurd ji bo zimanê Kurdî daketin qadan » r.3

- Li bakûrê Kurdistanê 100 şaredarî di destê Kurdan de ye.
- Şaredariyan delfetêñ di destêñ xwe de baş bikarnayîn..

Amed (Pêşketin): Li bakûrê Kurdistanê daxwaza sereke ya Kurdan perwerdeya bi zimanê Kurdi ye.

Dewleta Tirk bi her avayı diji vê daxwazê ye û mafê perwerdeya bi zimanê dayikê bo Kurdan nayê nasin. Li bakûrê Kurdistanê asimilasyon gihêştiye asteke pir xeter û bikaranina zimanê Kurdi bi taybeti bajarêñ wek Amed, Riha û çend bajarêñ mezin ên Kurdan de gellek qels e.

Li aliye ki asimilasyona giran a dewleta Tirk bi riya perwerdeya Tirkî û televizyonê Tirkî êdi rewş wisa bûye ku Kurd xwe bixwe ji asimile dikin. Malbat bi zimanê Kurdi naaxifin, zarokên xwe hini Kurdî nakin. Ciwanêñ Kurd ku têde beşike mezin ku xwe wek welatparêz nişan didin jî zimanê Kurdi bikarnayîn. Divê bikaranina Kurdi ser qûtiyêñ çopê a şaredariyêñ Colermeg û Şemzînanê bo hemû şaredariyêñ Kurd bibe minak. Dewama nûce di rûpela 3'an de



Gelo Google dibe Kurdi. R8

Ji xwediye ïmtiyazê yê Azadiya Welat re 21 sal cezayê girtinê » r.2

GOTAR
Perwerdeya bi
Kurdî meseleya
hebûn û tune
bûyinê ye
PESKETIN R5

TENDURISTI
10 sedem ji bo
spor kîrinê; Qe
nebe her roj
bazdin... R8

TENDURISTI
Diyarbekir di
bikaranîna 3G de
yekemîn e R8

ZANIST
Gesture Cube 3D;
Bi vê kupa
teknolojiyê jiyana
3d destpêdike R8

Naveroka Din
» Gotar r.5-6
» Zanist r.8
» Aktuel r.10
» Çand r.8

Çima serxwebûna
Kurdistanê, çima
rêvebireyeke xweser?..
SERHAD B.RÊNAS » r.5

Rewşa Kurda ji aliyê
Tayîp ve çawa
dixûyê?..
MAMOSTE MARUF » r.4

Weşanên HKMG:
HAWAR NET hawarnet.com
MUZIKKURD muzikkurd.com
SİNEMAKURD sinemakurd.com
ZANISTUTEKNOLOJİ zanistuteknojoli.com
KURDO kudo.me JINANE Jinane.hk-mg.net
ABORİNAS aborinas.hk-mg.net
HEMO: www.hk-mg.net

Dewleta Tirk ji dîsa amadekariya operasyoneke berfireh dike

Çavkaniyên herêmî diyar kirin ku di demên dawî de li herêma sînor tevgera leşkerî ya artêşa tirk zêde bûye

AMED (Pêşketin)

Çavkaniyên herêmî diyar kirin ku di demên dawî de li herêma sînor tevgera leşkerî ya artêşa tirk zêde bûye. Bi mehane êrişen ser Kurdan gav bi gav zêde dibe. Kurd têne kustin. Partiya wan tê girtin. Şaredar û sisetmedarên wan bi kelebcayê kirinê té girtin, na ve zarokên wan tê qedexe kirin, ji ber stranê Kurdi ceza û lêdan dixwin û êrişen cur bi cur. DTP hate girtin. Bi navê operasyona KCK bi sedan siyasetmedarên Kurd hatin girtin.

Herî dawî ji ev 3 rojin dewleta tirk weşana Roj TV'ye bi avetîna sînyalan asteng dike. Ev bûyer weki gaveke nû ya amadekariya operasyoneke berfireh ya dewleta Tirk ser gerilayen PKK ve hate nirxandin.

Dewleta Tirk dîsa amadekariya şerekî mezin ser Kurdistanê azad plan dike

Wek tê zanin, du sal berê de Parlamento ya Tirkîyeyê bona salekê destûr dabû artêşa tirk ku bikaniye êriş bibe derveyi sinoran û dest bi operasyoneke kiribû û li Zapê rasti têkçûneke mezin hatibû.

Piştî ku destûr derketibû, artêşa tirk bi alikariya istixbarî ya Amerikayê gelek caran bi hêzén esmanî û bejayı êriş biribû ser deverên Başûrê Kurdistanê ku çekdarên PKK weki meger bikar tinin. Arteşa dagirker a Tirk piştî ku li Kurdistanâ azad rastî têkçûneke mezin hat û 29ê sibatê de ji Kurdistanâ azad vekişya bû. Revina arteşa Tirk demeke dirêj him li di qada navneteweyi û him jî di medyaya Tirkân de bû mijara sereke ye. Çavkaniyên herêmî diyar kirin ku di demên dawî de li herêma sînor tevgera leşkerî ya artêşa tirk zêde bûye.



Heman çavkaniyan gotin ku ji aliyekek balafrîn casusiyê li herêmî keşfî dîkin û ji aliye din ve ji, hejmara leşker û alawêne leşkeri ya li herêmî têne zêdekirin. Çavkaniyên herêmî ev tevger weki amadekariyeke operasyoneke nû nirxandin. Çavkaniyên nézi PKK ji gotin ku, heger artêşa tirk bikeve nav hewldanekî din ya dagirkeriye, wê ji yên heta niha darbeyen mezin bixwe.

Armanca AKP tune kirina habûna rexistinî neteweya Kurd e

AKP ku bi hatina serfermanar bûna îlker Başbûg édi bi temamî kete di bin kontrola arteşa

Tirk li aliyeke amadekariye ser bo Kurdistanâ azad dike li aliyeke din ji bi girtina şaredariyê li bakûrê Kurdistanâ plana tune kirina héza Kurda li bakûrê Kurdistanâ dike. Hikumeta AKP ku di destpêka desthilatdariya xwe de bi helwesten xwe yên nerm li hemberî Kurdan li bakûrê Kurdistanâ ji hikumetaen berê ya dewleta Tirk cûda xuya dikir û édi AKP ji ser riya politikayê kevn diçe. HAWAR NET.com

Ocalan; Yan aştîyeke ku bandora wê gelek fireh bibe an jî dê şerekî gelek mezin biqewime

Li gorî nûcaya ANFê, Abdullah Ocalan li Girtixa Imraliyê bi parêzeren xwe re hevditina asayı pêk anîye û diyar kiriye ku ew hewl dide ku şer çenebe û wiha axaftiye: "Li Tirkîyeyê valatiyek heye. Heke kurd û hêzen demokrasiyê vê valahiyê danegirin dê şer dijwar bibe. Lé heke ev valahi bête dagirtin dê li Tirkîyeyê aştîyeke bi rûmet pêk bê." Ocalan, derbarê Partiya Aşti û Demokrasiyê (BDP) de ji nirxandin kirine û wiha gotiye: "Divêt ew weki pariyen beri xwe dûvikê nijadperestiyê bi dûv xwe ve neke" AJAN SAN

Kurd li bakûrê Kurdistanê jiyan rawestandin

AMED (Pêşketin)

Li Amed, Mêrdin, Şîrnex Riha, Erzîngan, Edene û navçeyen wan bi hezaran kesi bi daxuyani meşan 15'ê Sibatê şermezar kir. Di daxuyaniyan de hate xwestin û pêvcûn bi dawi bibe.. 15'ê Sibatê salvegera radestkirina Rêberê PKKê Abdullah Ocalan a Tirkîyeyê li Amed, Elîh, İdir, Westan, Saray, Gimigim, Bazid, Hayat, Mûs, Dîgor û Çelê bi girseyi hat şermezarkirin.

Li Amed, Elîh, Bazid û İdirê polisan mudaxaleyi girseyê kir. Li Stenbolê, bi minasebeta şermezarkirina 11'emin salvegera anina Rêberê PKKê Abdullah Ocalan a Tirkîyeyê daxuyaniyeke hate dayin. Girseyê piştî daxuyaniya girseyê xwest ku meşkê li dar bixe. Polisan bi bombeyen gaza û panzérâan êrişê girseyê kir û girseyê ji bi keviran bersiv da êrişâ polisan.

Li Kurdistanâ esnaf neçün ser kar Bi boneya şermezarkirina 15'ê Sibatê 11'emin salvegera radestkirina Rêberê PKKê Abdullah Ocalan a Tirkîyeyê, li Amed, Mêrdin, Şîrnex û navçeyen wan esnaf neçün ser kar û dikanen xwe venekirin. li Wan, Colemêrg, Agiri, Muş û li geleki navçan, esnafan derabayen dikanen xwe venekirin

AJAN SAN



Aloziya YNK û Goranê didome; Li Silêmanî bi şev propaganda qedexe ye



AMED (Pêşketin):

Komisyonê di daxuyaniyeke niviski de ku nusxeke wê ketiye destê malpera me, radigihan ku li ser pêşniyaza Lijneya Ewlekariyê ya parêzgeha Silêmaniyê ku ji bo parastina aramiya bajêr û parastina namzet û hemwelatiyan hatiye avakirin, komisyonê bîryar

da propagandaya hilbijartîne ya hemû qeware û listeyen besdar di hilbijartîne de li bajarê Silêmaniyê ji seat 21:00'ê hetanî 6:00'ê serê sibehê qedexe bike. Di daxuyaniya niviski de amaje bi wê çendê ji hatiye kirin ku ev bîryar dê ji işev ve bikeve piratikê û dê hetanî dawîya dema propagandayê ji berdewam bike. Her wiha her liste û qewareyek vê bîryarê binpê bike, dê bê cezakirin.

Doh, Melbenda Yekitiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK) ya Silêmaniyê derbarê şeva 16ê reşemîye de, daxwyanek da; di daxwyaniye de diyar kir ku di demjimêr 12:30ê şevê, dû otomobilên Lista Goran hatine ber Melbenda YNK û gulle bi ser melbenda navbirî de reşandine. Herwiha YNK di daxwyaniye de dibêje ku Kompaniya Wişê, bi bernâme rewş û keşhewaya helmeta hilbijartîne aloz dike û êrişî melbenda rexistinê ya Silêmaniyê ya YNK dike. HAWAR NET.com

Ji xwediye imtiyazê yê Azadiya Welat re 21 sal cezayê girtinê

Midûrê karê nivîsê û xwediye imtiyazê yê Rojnameya Azadiya Welat Ozan Kiliç, ji ber nûcayen di rojnameyê de hatine weşandin rastî 21 sal û 3 meh cezayê girtigehê hat.....

AMED (Pêşketin)

5. Dadgeha Cezayê Giran a Diyarbekirê, derheqê midûrê karê nivîsê û xwediye imtiyazê yê Rojnameya Azadiya Welat Ozan Kiliç de bi idia ya di 12 hêjmarên rojnameyê meha pûşberê

de bi propagandayê li ser navê rexistinê tawan kirîye 21 sal û 3 meh cezayê girtigehê da. Dadgeha digel cezayê girtinê, bîryara bêparhiştina wi ji mafê cemaweri, hilbijartîn û berbijeriyê, mafê endamtiya

komele, partiyen siyasi û saziyên civaki da. Herweha dadigehê bîryar da ku ceza neyê kêmkirin û ceza bi pereyan neyê dayin. Heyetê riya temyiza ceza vekiri hişt.

Rêngê asmanê Herêma Kurdistan sor bû



Bahozeke bîhêz û tîr a tepûtozê bajarên Silêmani, Hewlêr û çend navçeyen din ên Herêma Kurdistanê girt. Her ku diçe mesafeya ditinê kêm dibe. İro piştî nîvro sepoleke tepûtozê bajarên Hewlêr û Silêmaniyê girt û her ku diçe mesafeya ditinê bi awayekî berçav kêmtrî dibe. Rêvebiriya keşnasiyê ya Silêmaniyê ji diyar kir ku

şepola tepûtozê dê çend rojan bidome û car caran ji baran bibare. Cihê amajepêkirinê ye, havina sala bîhuri ji çendin caran bahozen bîhêz ên tepûtozê bajarên Herêma Kurdistanê girtibûn û ji ber vê yekê ji du welati jîyana xwe ji dest dabûn û bi hezaran kes ji rakiribûn nexweşaneyê

Bêşerefêni eniya Tirkmenan ala Kurdistanê cirandin

Tirkmenen di bin kontrola dewleta Tirk de han dîbin..

KERKÜK (Pêşketin): Şeva borî çend parêzeren namzeted ittilafa Dewleta Qanûnê, Mihemed Macid Beyati li nézi Duzê (ser bi Kerkûkê ye) êrişî xaleke kontrolê ya polisan dîkin û alaya Kurdistanê tînin xwarê û li şûna wê alaya Eniya Tirkmen ya Iraqê û posterê Beyati bilind dîkin.

Polisê Duzê derbarê bûyerê de heta nuha ci daxuyani nedaye û ji ber bûyerê ji welatiyên kurd ên navçeyê gelek dilteng bûne. Hêjâyê gotinê ye Beyati keseki tirkmen e û nuha ji li parlamento ya Iraqê parlamentere. "Zererdan bi sembolên dîni û niştimanî qedexe ye"

Serkomarê Iraqê Celal Talebani di beyannameyekê de daxwaz kir ku mixabin hînek namzeted ji yasan der dikevin û di daxwyaniye xwe de zererê li sembolên dîni û niştimanî didin. Ev yek li gor destûr, ol û axalaqê qedexe ye û berevajiya prensibên demokrasiyê ye."

HAWAR NET.com

Bêrîvana biçûk bang li wijdana raya giştî kir

Bêrivan S. di danışına yekemin de 7 sal û 9 meh ceza girt û bi nameyekû bû sembola zarokên girti. Bêrivanê, nameyekî din ji ji Serokê İHD'a Elezîz Nafiz Koç re şand. Bêrivanê di nameya xwe de diyar kir ku dema ew hatiye binçavkirin, polisan çefî li serê wê pêçane û wénêye wê kişandine. Bêrivanê destnişan kir ku polisan işkence lê kirîye û wiha got: "Dema ku min girtin, pir li min xistin. Min fêm nekir çîma wiha li min kîrin. Heke ku zarokên wan wiha bikiranâ dê wan ji bia vêtana girtigehê? Ez hê 15 sali me. Min girtigeh heq nekiriye."

Şaredariyên di destê Kurdan de ji bo zimanê Kurdî berpirsyariyên xwe naynin cîh!

Li bakûrê Kurdistanê 100 şaredarî di destê Kurdan de ye. Lê mixabin wan şaredariyan delfetên di destê xwe de baş bikarnayîn.

D.BEKİR (Pêşketin)

Li bakûrê Kurdistanê daxwaza sereke ya Kurdan perwerdeya bi zimanê Kurdi ye. Dewleta Tirk bi her avayı diji vê daxwazê ye û mafê perwerdeya bi zimanê dayikê bo Kurdan nayê nasin. Li bakûrê Kurdistanê asimilasyon gîhêstiye asteke pîr xeter û bikaranina zimanê Kurdi bi taybeti bajarén wek Amed, Riha û cend bajarén mezin ên Kurdan de

gellek qels e. Li aliyezi asimilasyona giran a dewleta Tirk bi riya perwerdeya Tirkî ú televizyonê Tirkî édi rewş wisa bûye ku Kurd xwe bixwe ji asimile dikin. Malbat bi zimanê Kurdi naaxifin, zarokên xwe hîni Kurdî nakan. Ciwanen Kurd ku têde beşike mezin ku xwe wek welatparêz nişan didin ji zimanê Kurdi bikarnayin.



Divê bikaranîna Kurdi ser qûtiyên çopê a şaredariyên Colermeg û Şemzinanê bo hemû şaredariyên Kurd bibe minak

Divê bikaranîna Kurdi ser qûtiyên çopê a şaredariyên Colermeg û Şemzinanê bo hemû şaredariyên Kurd bibe minak. Rewşike wisa derketiye holê ku édi bi qasê dewleta Tirk, Kurd ji di mijara zimanê Kurd de súcdar rin û di pêkhatina asimilasyonê de berpirsyarin. Perçeyeke vî rewşa xirab ji şaredariyên di destê Kurdan de ne pêk tinin.

Niha li bakûrê Kurdistanê 100 şaredarî di destê Kurdan de ye. Lê mixabin wan şaredariyan delfetên di destê xwe de baş bikarnayîn. Şaredariyên Kurd ku bi avayekî mafdar gili ú gazincen xwe ji dewleta Tirk tînin di heman demê de ji alikariya asimilasyonê dikin. Ji xeyni çend xebatên biçük ên çend şaredariyan weki şaredariya Amedê ji bo zimanê Kurdi xebatên berbiçav nayê kîrin. Divê di vî mijarê de şaredariya Amedê were piroz kîrin. Her çığa kêm be ji di nav şaredariyên Kurd de şaredariya Amedê û çend şaredariyên wek şaredariya Şemzinanê ji bo zimanê Kurdi hewlêna baş didin.

Şaredariyên Kurdan ên bakûrê Kurdistanê divê çi bikin?

- Hemû şaredariyên Kurd a di destê BDP de ne, dikarin hemû afiş û ilan û bang ú pirozbahî ú reklamên xwe yên navxwe li gel zimanê Tirkî bi zimanê Kurdi ji bikin. Li pêsiya vî tiştî niha astengiya qanûnî tune ye. Tê ditin ku şaredariya Amed û çend şaredariyên hin caran afişen xwe bi Kurdi ji amade dikin lê ne hemû...

- Hemû şaredariyên Kurd, dikarin ser otobus û qamyon ú wesayîten xebatê ú qûtiyên çopan û kertên otobusan û

ser lewha ú tabelayên xwe de li gel zimanê Tirkî, zimanê Kurdi bikarbinin.

- - Hemû şaredariyên Kurd divê her xebatên xwe de li gel zimanê Tirkî zimanê Kurdi ji bikarbinin. Wek minak şaredariya mezin Amedê pirtikê nasandinê ku ji bo 'Mala Rojê' amade kiriye tenê bi zimanê Tirkî ú Engilizi ye. Her wiha pirtûka nasandina bakûrê Kurdistanê ji bi Tirkî ú Engilizi bú. Di gellek xebatên bi vi rengi de zimanê Kurdi ji aliyê şaredariyên Kurd ve tune tê hesibandin. - Hemû şaredariyên Kurd, dikarin zebita ji tev de ji bo hemû xebatkaren xwe qûrsa

zimanê Kurdi bidin û xebatên navxwe ji bi zimanê Kurdi bikin.

- Xebatkaren hemû şaredariyên Kurd divê bi gel re bi zimanê Kurdi biaxfîn. - Hemû şaredariyên Kurd divê di malperên şaredariyên xwe de beşa zimanê Kurdi vekin.

- Hemû şaredariyên Kurd divê di bultenên xwe de li gel Tirkî heri kêm %50 ji zimanê Kurdi bikarbinin. Béguman zedetir xal dikare bê rez kîrin. Lê ji bo dema niha xalén li jor ji bêne pêkanin wê téri bike. HAWAR NET.com



Roja zimanê zikmaki

21ê Sibatê, Roja Zikmaki ya Navneteweyi ye. Ziman nasnameyê çedike. Em bê zimanê dayîka xwe nikarin jiyanekî bi wate û birûmet bîjin. Profesor Maria Borgström (1998) dinivise, dibeje mirov nikare bê nasnameya xwe, jiyanekî bi wate û birûmet bîji. Li gori wê mirov nikare bê nasnameya bîji. Nasnameya mirovi hebûneke birûmet û ew rûmet di zimanî de ye. Li gori Unesco ji 6000 zimanan, 199 ziman ji aliyê 9-10 kesan ve tê pey vandin û bi qasi 200 zimanen di ji, ber bi mirinê ve diçin. Zazaki yek ji wan zimanan e, ku ber bi mirinê ve diçe, ji lewre divê zazaki bê parastin. Gorani û lûri ji, ber bi mirinê ve diçin. Di sala 1999an de roja zimanê zikmaki ji aliyê UNESCO (FN) ve hate pejirandin û bû roja zimanê zikmaki ye navneteweyê.

Kurd ji bo zimanê Kurdî daketin qadan

Li Stenbol, Wan, Gimgim, Colemêrg, Amed, Qers, Semsûr û Elbakê, bi boneya Roja Zimanê Dayikê daxuyanî û meş hatin lidarxistin. Di meş û daxuyaniyê ziman de daxwaza perwerdehiya ziman hate xwestin

Bi hezaran Amedi ji bo zimanê dayikê meşian Tevgera Ziman û Perwerdehiya Zimanê Kurdi (TZPKurdi) bi mebesta 21ê Sibatê Rojana Ziman a Cihanê li Amedê, ji ber avahiyê KURDİ-DER'ê heta parka Koşuyoluyê meşike girseyi pêk ani. Serokê Giştî yê KURDİ-DER'ê li ber parka Koşuyoluyê daxuyaniyek da çapemeniyê û got: "Têkoşina me ji bo vê yekê ye û heta ku em van mafen xwe yên rewâ û demokratik bi dest bixin ew û bidome. Bi van bir û bawerîyan em Roja Zimanê Dayikê û Sala Wekheviya Çand û Zimanan li hemû mirovén azadixwaz piroz dikin." Li parkê dersa metamatiqê ya bi kurdi hate dayin. TZPKurdi, xwest 21ê Sibatê Roja Ziman a Cihanê Roja Serhildana Zimanê Kurdi bê ilankirin

'Bila wekil bi kurdi bi axivin' Hevserokê BDP'ê Selahattin Demirtaş, bi munasebeta 21ê Sibatê Roja Ziman a Cihanê Navenda Giştî ya KURDİ-DER'ê ziyaret kir. Demirtaş ú heyeta BDP'ê ji aliyê re'veberen KURDİ-DER'ê ve hatin pêwazikirin. Demirtaş, diyar kir ku ew girîngiyê didin xebatên KURDİ-DER'ê yên ji bo ziman û wiha got: "Xebatên KURDİ-DER'ê û li diji bisâftina ziman ji bo me gelek girin in. Ger ku qadên perwerdehiyê ji bêne vekirin dé baştir bibe. Divê ziman di qada huner, çand, wêje û siyasetê de ji bê bikar anin. Demirtaş, Roja Ziman a Cihanê li kurda piroz kir û serkeftin ji xebatên KURDİ-DER'ê re xwest. Piştire Berdevka TZPKurdi Hatice Şen xwest kurdi bibe ziman fermi û perwerdehiyê. Sen, ji Demirtaş xwest weki wekilên gelê herêmê ew ji bu kurdi bi axivin û wiha got: "Divê hûn û wekilên gel tev bi kurdi bi axivin." Ji bo dewama nûçeyê HAWAR NET.com

TEVKURD û Çira li Amedê bo zimanê Kurdî meşian



AMED (Pêşketin)

Tevgera Neteweyi ya Kurd-TEVKURDê, bi mebesta pirozkirina 21ê Sibatê "Roja Zimanê Zikmaki ya Navneteweyi" civineke çapemeniyê lidar xist û ji bo bal kişandina li ser xeteriya li pêşberê zimanê kurdi li seranserê Amedê bi qasi 10 hezar belavokén bi Kurdi-kurmancî û zazaki belev kirin...

CIRA; "Asimilasyon süceke li diji mirovahiyê ye"

Komleya Çand û Huner ya CIRA ya Amedê, bi daxuyanî û meşike girseyi "Roja Zimanê Zikmaki ya Navneteweyi" piroz kir. Bi mebesta 21ê Sibatê Roja Zimanê Zikmaki ya Dinyayê li ber avahîya Komleya Çand û Huner ya CIRA ya Amedê, bi besdariya birêvebir û

endamên komeleyê civineke çapemeniyê hat lidarxistin. Héjayed gotinê ye ku piştî pêşkêşkirina daxuyaniyê, ji sedi zêdetir endam û birêvebirên Komeleya CIRA, bi pankart û flamayêن ji ber avahîye heta AZC Plazayê ya taxa Ofis meşek lidarxistin. HAWAR NET.com

Ji 28 zimanan tenê tirkî zimanê perwerdehiyê ye

Piştî UNESCO'yê biryar da ji sala 2000'an heta niha li gelek deveren cihanê tê pirozkirin. Li gori rapor û belgeyên UNESCO'yê niha li cihanê ji 6 hezar û 700 ziman heye û névîyên wan bi tunebûnê re rû bi rûne.

Li gori hin çavkaniyan li Tirkîyê 20 ziman hene û geleki wan di bin xeteriyê dene. Li gori lêkolina Zimanzanê kurd Amed Tigris, li Tirkîyê, abazayî, abhazî, adigeiyî, erapi, arnavutî, azerî, bosnakî, bulgarî, domari, erməni, gagavuzî, gurcî, kabartayî, kazakî, kırkizî, tirkiya kirimi, kumukî, kurdi, ladino, lazi, oseti, ozbekî, romanî, rûmi, suryani, katari, tirkî û turkmenî bi tevâhi 28 ziman tênaixaftin. Lê ji 28 zimanan tenê zimanê tirkî fermi ye û bi tirkî perwerdehiyê tê dayin.

Generalê ku Ocalan ji Kenya biribû Tirkîyê hate girtin

Li Enqerê di operasyonekê de Korgeneral Engin Alan, ku serokê PKK Ocalan ji Kenya girtibû û ani bû Tirkîyê, hate girtin. Korgeneral Alan ew operasyon birêve biribû. Korgeneral Alan, di sala 2004 de bûbû xanenîşin. Her wiha wi Şemdin Sakîk ji girtibû û ji başûrê Kurdistanê biribû Tirkîyê. Alan her wiha serokê Weqfa Hêzên Eskebi yê Tirkîyê bû.



HAWAR NET / NÜÇE Ü AGAHÎ

TU LI KÜ Bİ, NÜÇE LI WÊ DERÊ YE

Perwerdeya bi Kurdi meseleya hebûn û tune bûyînê ye

Di vê pêvajoya ku Kurd ewqas nêzî bidest xistina hin mafêن xwe yên neteweyî bûne divê Kurd ji her demî zêdetir xebatêن xwe zêde bikin

PÊŞKETIN / HAWAR NET

Kurd doh li tevahiya bakûrê Kurdistanê ji bo zimanê Kurdi derketin qadan. Rexistinê cûda ji bo yek armancê meşyan ev armancê daxwaza perwerdeya bi zimanê kurdi bû. Wek tê zanîn armanca sereke ya Tirkan helandina zimanê Kurdi û asimile kirina zarokên Kurdi e. Di navâ 90 salê de Zimanê Kurdi beramberi hemû hewlîn zordari û çewsandîn re rûbirû ma bû ji ber pêkerêne wek lêz zêdebûna rejeya serjimeriya Kurdi û neşîyandina malbatan Kurd keçen xwe li dibistanê Kurdi hin ji heyîna xwe diparêze. Tirkîye, li şuna ku reforman pêkbîne, xwe li gor kriteren YE biguhurine, dest davêje re û metodên helandinê yên nû, yan jî yên heyî xurtir dike û dilezine.

Dewleta Tirk dibistanê leyli(YİBO/tirkî:yatîlî bölge ilkögretim okulları) bi heman armancê angò bo asimile kirina zarokên Kurd avakiribû. Tişteki diyar e ku, iro li bakûrê Kurdistanê şertîn hundurin ji bo helandin ú tunekirina kurdan li gor 20-30 sal berê sivikir bûne ji bo dewletê. Her wiha di seri de divê mafê perwerdeya bi zimanê Kurdi bo zarokên Kurd were dayin ú erka dewleta Tirk e ku dibistanê Kurdi ava bike ú di warê aborî de jî hemû wezifeyen xwe pêk bine ji ber ku Kurd ji weke Tirkan bacê didin û mafê wan e ku xizmeten perwerdeya bi zimanê Kurdi bê pere werbigrin..

Divê dewleta Tirk di seri de hebûna Kurdan biecibine û piştre ji delfeta perwerdeya bi zimanê Kurdi biafrine. Niha sedemekî din ya heri giring ya helina zimanê Kurdi bandora medyaya Tirkî bi taybeti televizyonen Tirkî ye. Medya bi taybeti televizyonen heyî yên Kurdi têri ixtiyaca Kurdan bike. Televizyonen ku ji Kurdistana azad weşan dîkin ji him bo bakûrê Kurdistanê kêm weşan dîkin him ji aliyê qelîteyê ne zêde pêşketine ú lewma ji bala Kurden bakûr naşşin. Beri her tiştî ji bo parastin û pêşkîstina zimanê Kurdi perwerdeya bi zimanê Kurdi pêwiste

Hin malbatên Kurd bi sedema ku zarokên wan di dibistana sereteyi de zorê neşînin û ji hevalen xwe dûr nemina hîni zimanê Tirkî dîkin û hîni zimanê Kurdi nakin. Divê malbatên Kurd dev ji vi çewtiyê xeter berdin. Divê zarokek beri zimanê dayîka xwe hin bibe. Malbatên Kurd bo dibistinê dikarin pişti 6 saliya zarok xwe hîni zimanekî din bikin. Her wiha malbatên Kurd li şuna ku hîni zimanê Tirkî bikin ú meselya dibistana Tirkî bifikirin divê ji bo destpêkirina perwerdeya bi zimanê Kurdi bikevin nava hewldanan.

Zarokeki ku temami zimanê xwe ú çanda xwe hin nebe ev zarok nikare bi temami hîni tu çandi na ji zimanî bibe ú avayeki xwezayi di vê zaroké de "bê nasnameyeti" derdikeve holê.

AKP diji perwerdeya bi zimanê Kurdi ye

Wek tê zanîn pêvajoya "rêliberkekirina" hikumeta AKP a bo çareseriya pirsgirêka Kurd sekini. Herçiqas derdorê AKP'yi dibejîn "rêliberkekirin" berdewam bike ji ú h, nek al, yên din ji ji ber sekinina projeyê PKK'ye súcdar bikin ji li gor agahîyen veşarti j, nav dewletê derdikeve holê ku eger pêvejo nsekinibûya ji di bingehê projeyâ "çareseriya" pirsgirêka Kurd de dayîn mafê netewi a Kurdan bi tu avayî tune bû. Gor agahîyan plana dewleta tirk ev bû ku nişaneyen çareser kirinê bide raya giştî û Kurdan re hêvi bide ú bi vê avayî çend salen din ji bi propaganda ya çareseriye Kurdan mijul bike. U çend salen din ji bi dayina dersen bijarti ên Kurdi di dibistanan de Kurdan bixapine ta ku piraniya Kurdan bi temami asiMile bikin pêvajoyé bidomine.

Li gor lêkolinan lêza asimile bûyina Tirkan ji ber pêşkîstina perwerdeyê li bakûrê Kurdsitanê û zêde bûna hejmara televizyonen tirkî ú bi teami asimile bûna nifşen nû ji ber çend sedemîn cîvaki ú sosyal gellek zêde bûye.

Kurd bi zêde kirina xebatên xwe dikarin serkevin

Çavdarêni siyasi ú pisporê stratejiyê diyar dîkin ku di vê pêvajoya ku Kurd ewqas nezi bidest xistina hin mafên xwe yên neteweyî bûne divê Kurd ji her demî zêdetir xebatên xwe zêde bikin. Ji ber vê yekê ji divê Kurdan zêdetir kar û xebat bimeşin. Ji bo Kurd hemû mafên xwe bidest bixin divê Kurd zêdetir bihêz bibin. Dewleta Tirk ji bo berjendiyen xwe hin gavan daveje, eger Kurd xwe bihêzir nekin dé Kurd nikaribin mafên xwe yên din bi dest bixin.



Rewşa Kurda ji aliyê Tayîp ve çawa dixûyê?...

MAMOSTE MARÛF

Bala xwe bidinê, desthilatdariya tirk û -ci islamparêz, ci demokratén liberal, ci çepgir ú rastgir ú Kemalist, ci kurdên ji refen xwe vejeti û li dû qwinâ xelkê keti- hemî hevkar û piştevan ú şirikên wê, bi yek dengî radibin rûdinin dibejîn "bila Çekdarén Tevgera Azadiya Kurd; hêvi û parêzvanen dawîya dawîn ên Gelê Kurd, bê deng, bê qal û qir bê teq ú req xwe ji çek ú rest bikin bê". Ecêb ú gosirmeta mezîn ev e ku; ew heta niha tu car, ji bo çareseriya tu pirsgirêkê nehatine cem hev, li ser hev necivîne, li hev nekirine, lê çawa dibe kes pê nizane, di warê çek berdانا kurda de teqez tifaqa xwe dîkin yek, li hev dîkin. Wek minak, ew li ser Ergenekonê bi hev nakin.

Li ser mafên mirovan bi hev nakin.

Li ser çareseriya pirsgirêka Qibrîs û Ermen û yewnan li hev nakin... Li ser guherandina zagona bingehin a leşkeri ya 82' yan li hev nakin. Di warê çareseriya pirsgirêka Kurd jî gixa li ser tu mijari li hev nakin... Lî gixa dor tê PKK'ê tev dibin yek, bi yek dengî û bi yek rengî dibejîn bila dev û dest ji çek berdin û werin bikevin ber bextê dewletê. Ez ji dibejîm belê, bila bê. De ka piştî hatina wan dê hûn û ci bikin? Dê hûn û nasnameya Kurda bi awaki fermi bipejîrinin? Dê hûn û zimanê Kurdi ji afat û tofan û lehiya asimilasyonê rizgar bikin? Dê hûn û zarokên Kurdan ên xwendekarên dibistanê seretayi yên hêj destekî gost in, ji sonda njadperest a "tirk im, dirust im, ...ez bi can û cendek qurbana hebûna tirkan bim" biparêzin an?

Dê hûn û Erdnigariya talankiri, wêran û wêrtaskiri ya Kurda, ji nû ve şen û ava û aram bikin?

Dê hûn û Kurda, ji bêşixuli û ji xizanî û ji nezaniyê, bi kurtasi ji "bérümetyi heşte salan a li ser wan ferz kiri" rizgar bikin? Ji dewletê tu deng dernayê... Bersiv, ji berdevkên wê yên di dilqê ronakbir û rojnamevan ú siyasetmedarê -Xwedê giravi sivil in-tê: "wa ye Tayip dixwaze pirsgirêkê çareser bike. Ew tujika dewletê ji, bîniya dewletê ji dinase. Ma hûn ji wi çetir dizanî ka rewş û hal û ehwal çawa ye? Dê ew û vê pirsgirekê bi awakî (?) çareser bike. lê, divê dora pêsi aliyê kurd çek berde û bê..."

Bi gotina wan, bi saz kirina TV 6 a bi kurdi, bi levkirina guherandina navên tirkî yên gund û bajaran, bi nivcoki bîryardayina vekirina enstituya zimanen-ku derheqê wan de di dilê xwe de dibejîn Xwedê gehra xwe li wan bike, hêj nemirine mane- zindî, çend şertîn çareseriye hatine cih. Ên din ji(?) piştî çekberdan û hatina gerila dê bén cih...

Bi ya wan, li ser navê dewletê û hêzên mezin ên Cihanê Tayip ji ditiye ku édi ev pirsgirêk gere bê çareser kirin. Ew bi dilê xwe yê sax bang li PKK'ê dike dibêje were... ***

Meleyê gund, her cara ku bo azandanê derdikeve ser banê mizgeftê, çavê wi bi jinekê û mîreki dikeve. Her du li ser xêniyê xwe tim û tim rûnişti ne û bi hev re ken û henekan dîkin. Bala xwe didê ev meleyê gund e. Mele bê pirs û bê tekliif dike fişefî û jê re dibêje: "Porkurê ez bo te mirime, xéra mezinên xwe ji sing û berê xwe yê sipî û qerqaş, ji dev û lîvîn xwe yên şirin û şekirin ramûsanek kerem bike!"

"- Mele, eyb e, şerm e tu van gotinan diki! Heke mîrê min bi vê bênamûsiyê bîhise ew é te ji bikuje, min ji..." Û direve dikeve malê.

Jinik: "- wele tu dizanî" û dike biçe malê. Mele bi milê wê ve digire, dibêje; "Mele Qurbana te be canê! Ka şertîn xwe yên din ji bibêje."

- Tu yê roja inê ewkê xwe ji nişani Cemaetê bidi.

Mele disa soro moro dibe lê, dibine ku dê

"- Mele, mele! Xwedê te şas kiriye; tu ci diki?"

Mele berê xwe didê, dibersivine: "- Kurê kerê, ma min ji te re negotibû ji wir wisan dixûyê!"

HÊZAXÊZ



Tahma siyasetê bi zimanê gel xweş e ...

FAHRÎ KARAKOYUNLU

Sal 1977, ez li Batmanê- wê demê navçeya Sertiye bû- mamoşayê zimanê Tirkî me. Ji ber ku min dibistana navin li Enquerî li ba kekê xwe xwandin, Tirkîya min û tewrê min ji bili mamostatiya min ji balkê bû. Ya din ji, perwerdeya zimanê Tirkî ji di warê ziman de ez hin pişdabiribûm. Ji ber vi, ji aliyê zimanê Tirkî de tu kimasiya min tune bû. Bi rasti ji ji aliyê zimananzîyê de Tirkîya min ji Kurdiya min baştir bû. Wê demê ji ber ku me şoreşeriti dîkir, peywira dewletê ji bo me pirr ne giring bû. Di vekirina komelâyekê de min axaftina vekirinê bi Kurdi destpêkir û dû re min bi zimanê Tirkî command. Li ser axaftina min a bi Tirkî de, ji nav civatê yekî navsalî mudaxelâyi min kir û wiha got "Te xwezi axaftina xwe bi kurdi berdewam bikira, lewra Kurdiya te ji Tirkîya te baştir û xweşir bû." her çikas min xwast ez kîmasiya xwe rast bikim ji, lê peyvê care cihê xwe ditibû.

Lewra ziman ne tenê ji hînek hevoka tê avakirin û tenê armanca xwe di navbera mirovan de pergala fêmkirinê ye. Di zimanê zikmaki de tamek heye, ew tam çikas tu zimanekî biyani ji zimanê xwe yê zikmaki baştir ji zanibe, tu cari wê tama ku mirovan bi zimanê zikmaki digre tu car nade. Ew zimanê biyani, di devê mirovan de dibe wek gongileki çavbelok.

Ev anekdota ji bo min bû guhareki zérin di guhê min de. Her çiqas wek grûp em neteweperwer bûn ji, lê cepitiya me ji hebû. Lewra di ideolojiya cepitiyê de (Stalinist) ziman, di navbera mirovan de pergalek fêmkirinê bû. Gor vê ditinê gava şoreş ava be, wê demê, pirsa ziman ji dê bi xwe çareser be. Lî mixabin tevgeren Kurd yê bakûr bi tevayî di pirsa ziman de kêm ketin.

Ev şâşiti ji cepitiya sekter dahat. Yê ku di mesela ziman de bi israr bûn, tewrê wan wek nijatperesti bi nav dibû û dahatin gunabar kirin. Lî mixabin ev siyaseta ne rast ci bi ci heta iro hat.

Siyasetmedar û reşenbirên gelê Kurd gere bikarîna ziman, ji xwe re wek xetek sor bipejîrinin û ji nérinê berê yê ne rast xwe dûrbixin..

Gelê Kurd di diroka xwe de gelek caran di pêvajoyen giring ú tenik de derbasbûye. Ev pêvajo ú konaxén kû tê de derbasbûne, gelek cara ne bi destê gel lî mixabin bi destê dijiminê gelê Kurd qewimiye. Lî ji sedeman yek ji, ji aliyê hiş û ramanen netewi de qelsi û nezaniya me Kurda bûye. Ji ber vê yekê di demen borî de gelê Kurd bi her kîmasiyê xwe ji berxwedaye, lî mixabin ger şertîn navnetewi û ger konjotura dinê û siyaseta nijatperest a dagirker, rê li ber siyasetek xurt û sererast a di nav gelê Kurd de ci bigre de girtiye.

Pirsgirêka zimanê Kurd bi rasti ji mijarek vê nivîsê zêdetir e. Armanca min ne ku pirsa zimanê Kurdi di nivsek wiha de sererastkirin e. Li disa ji, dixwazim hînek xalan binirxinim.

Ziman, wek me li jor bahs kir ne tenê fêmkirinê kesa ye di navbera xwe de. Ziman fîkr û raman, hest û daxazên ciwatê ye. Lorîken devê dayikan, şin û şâhiyê gel, mesele û metelokên wan, xewn ú xeyal, pêkenok ú serpêhatiyen gel e. Kesayeti ú psikolojiya gel, erdingari ú dirok di ziman de vesartîye. Ji ber vi, tê gotin gava tú dixwazî geleki ji holê rake, ewil zimanê wi geli xira bike. Her çiqas ziman beşek ji çandê be ji, nîrxen çandê ji xwe bi ziman ifade dike.

Ziman ji bo Kurda – teybeti Kurden Bakûr- siyaset bi xwe ye . Ger em ji bo siyaseta Kurd ziman grîng nebinin û ziman nekin bingeha siyasetê, tû wata siyaseta Kurd namine .

Gava ku em li zagona bingehin binerîn, di vê zagona bingehin de tê gotin, Komara Tirkîye réz li mafên mirova digre û komarek demokratik û hûkûki ye. Lî di pratikê de qey wisa ye? Na. Ger hukuki be hukuka Kurda di nav zagona bingehin de ci ifae dike? Hukuka hatiye naskirin, çikasi réz li nasnama Kurd û zimanê Kurdi digre? Gava ev pirsana bêni pirsin, bersiva van pirsana inkarkirin e, tunebûn e, şiddet e, girtigeh e.

Siyasetmedarûn Kurd û partîyen Kurda ku dixwazin biserkevin, gere zêdetir bi Kurd bin, zêdetir siyasete Kurdiyatîye bikin, bê qeyd û şert di heman çalekiyê xwe de civinen xwe de zimanê Kurdi bikarbinin. İmkanen di destê siyaseta Kurd de ev roj zêdetir e. Gava di vi wari de bi baweri tevbigere, wê ciwat û malbaten Kurd ji agadar be û dê hîn li mafê xweyê xwazî, insanî, wê li zimanê bav û kala, li zimanê şérin xwîderkeve. Ger em her malekê bikin mamoşayek dê doz biserkeve.

fahrikeya@mynet.com

Çima serxwebûna Kurdistanê, çima rîvebireyeke xweser?

Serhad B.RÊNAS

"Netewa Kurd her çiqas diroké de dewlet û rîveberiyê bi hêz avakiribe ji ji ber cihê xwe ya jeo-politik a Kurdistan, ber sedemén wek paşdemayina civaka Kurd, di nav civaka Kurd de nebûyina çina rewşenbirî, ziyanâ ku bi sedsalan li Kurdistan hatine kirin, bêzâr bûn û tîrsa dewletên Cihanê ji diroka Kurdan û nexwestina wan a serbixwebûna Kurdan, kîşeyâ oli û gelek sedem û arişeyên din gelê Kurd serxwebûna xwe dest nexistiye. Ji bo gelê Kurd jiyanek baş û biewle, bo parastina dirok, berdawamîya û pêşketina şaristaniya Kurd, parastina nirx û rûmeta Gelê Kurd ji dijminan, bo pêşketina Kurdan di warén êje, muzik, huner, mimari, zanist, teknoloji û hwd. de, bo pêşketina çand, abori, zimanê Kurdi, modernizasyona civaki, bo bilind bûna standartên jiyanê û dahanuyekê azad bo mirovê Kurd ji xeyni "Kurdistanek Serbixwe" altarnetifek din nine. Hemû çareseriye din çareseriye demine.

Bi taybeti bo gelê bakûrê Kurdistanê aango perçeya Kurdistanê ku di bin desthilatdariya Tirkîye de ye cihe bûn bo berjewendiyê dema dirêj û pêşketina giştî riya heri gûncaw e. **Şêweya Rîveberiya Dewleta Tirk**

Dewleta Tirk di seri de ser bingehêke çewt hatiye avakirin. Pêkhatinek ser bingehêk çawa bê avakirin wê bi vê avahi pêşdikeye. Di mantaliteya dewleta Tirk de "gel" nine. Dewlet bo zumre û çina sereke heye. Gel garantiya berdewamiya wan e. Ji ber vê yekê di nav gelê Tirk de ji her tim pêşketina enttelektuelizm û hatiye bisinor Kirin. Rewşa aboriya gelê Tirkîye her tim di astekê nîzm de hatiye hîstîn. Gel di her konaxê de bi futbol, magazin, ol, niqâşen vala û bê bingeh, nijadperestî û bi gele tiştên din hatine ewiqandin. Di vi şêweya rîveberiyê de armanca sereke bi avayeki pivandi paşa xistina gel. Pêşketina gel bo gruben berjewendixwaz ya rîveberiya Dewleta Tirk xeter e. Dewlemend bûna gel di hêla

abori de bi giştî zana bûn, pêşketin, fam kirinaastiyân, fikirin, têgihêştin, xwendin, helsengandin, şareza bûn û bi wan re girêdayî midexaleya gel bo rîveberiyê ji bixwe re tine. Ji bo ku wan gruban ku ji sermeyadar, çete, mafya, çeteyên nava arteşa Tirk û çeteyên sûyasi-leşketi pêş tê ji berjewendiyê xwe nebin hin ji li Tirkîye li ser domandina şêweya rîveberirinê ku li jor de hate behs kirin bi israrin. Heman şêweya rîveberirinê di dirokê de gellek welatan de ji hatiyê cébecekirin.. Li Tirkîye heremen heri paşdamayı herêma Kurdistanê ye. Kurd bi temamî dev ji doza netewi berdin ji wê pêşketina herêmê Kurdistan her tim were asteng kirin. Ji ber ku tîrsa perse bûn tu cari ji ji nav dilén wan gruben rîveberiya Tîrkan dernakeve. Bi destxistina mafen neteweyi ya gelê Kurd li alîyêkî ne mimkune ku Kurd beyi dewletek serbixwe ya Kurdistanê jiyanake pêşketi di ware ekonomiyê, jiyanake bi ewle û xwedî strandartên bilind, xizmeten baş ya tenduristi, perwerde, jîngeh, delfetên sosyal û hwd. nikarin bi dest bixwinin.

Ev rewş kêm zêde bo hemû perçeyen Kurdistanê eyniye. Her wiha li ser vê axa Kurd bi hezran sal dijin û di wan hezaran sal de teybetmendi û hewcedariyên cûda pêkhatiye. Her netew encax xwe bi xwe dikare bi rîvebibe ser esasê aidiyet û taybetmîdiyên xwe yêndiroki. Ku niha li Kurdistanê di nîşen nû de hemû wan kîşeyen giring tê ditin.

Şêweya dewleteke Kurdi

Raste ku dewleteke serbixwe ya Kurdistanê xwe bi xwe çareseriya hemû wan kîşeyen bi xwe re nayine. Tenê "serxwebûn" ne wateya azadi, pêşketin an ji çareseriye ye.

Lê heri giring ewe ku firsenda rîkubpek kirina dewleteke Kurdistanê bi temamî destê Kurdan de ye. Ger berovaji dewleta Tirk, dewleta Kurdistanê ser bingehêke dirust bê vakirin wê hemû tiştên ku li jor bo hatibûn réz girtin wê béguman pêk werin.

Serxwebûn di hemû perçeyan de

Niha kêm parti an ji rîexistin henin ku pirsgirêka neteweyi ya Kurd weki pirsgirêka Kurdistanê nişan didin.. Piraniya rexistinê Kurdi kîşaya Kurdistanê weki kîşeyâ Kurdi tinin rojevê. Beri her tiştî ber nemeyekê netewi pîwiste. Ger gelê Kurd pêşketinê Cihanê baş bixwine, bi stratejiyekî neteweyi biliwe, gîringiye serxwebûnê tebigihê, hevkarîyên xwe yêndiroki. Ku niha li Kurdistanê di nîşen nû de hemû wan kîşeyen giring tê ditin.

Şêweya dewleteke Kurdi

Raste ku dewleteke serbixwe ya Kurdistanê xwe bi xwe çareseriya hemû wan kîşeyen bi xwe re nayine. Tenê "serxwebûn"

ne wateya azadi, pêşketin an ji çareseriye ye.

Lê heri giring ewe ku firsenda rîkubpek kirina dewleteke Kurdistanê bi temamî destê Kurdan de ye. Ger berovaji

dewleta Tirk, dewleta Kurdistanê ser bingehêke dirust bê vakirin

wê hemû tiştên ku li jor bo hatibûn réz girtin wê béguman

pêk werin.

Serxwebûn di hemû perçeyan de

de ye.

serhadbrenas@yahoo.com

Hukûmetê û çeteyan dîsa girtin hev

ZINARÊ XAMO

Anqere li bin guhê hev ket. Ev 2-3 roj in hukûmet û dezgehêndadweriyê ketine gewriya hev û hevûdu digerînin.

Ev cara pêsiye ku hukûmeta AKP-ê û dezgehêndadweriyê bi vî rengi tîn hemberi hev û hevûdu bêminet dîkin. Herdu seri ji hevûdu bi ihlalkirina û siyasikirina qanûnan súdar dîkin. Berê ji çend caran di nabêna hukûmet û erka dadweriyê da hin nakoki û gelş derketibûn, lê ne bi vî rengi.

Ya icar pir mezin û pir cidiye.

Loma ji dikane hişê hukûmetê bine seri û mecbûri guherandina hin qanûnan bike. Ne xwe ev yek tim dikane were serê hukûmetê.

Ji ber ku piraniya endamên dezgehêndadweriyê ji bêtrefiyê bêtir, di bin "emrê" artêşê da ne û li gor emir û direktifên leşkeran tevdigerin. Loma ji gava dixwazin ji hukûmetê ra gelş û astengiyê derdixin, sergîjîyê çedîkin. Lê li gel vê ji ne diyar e ku hukûmetê icar ji weke carê berê bi neheq û súcdaran ra li hev neke. Vê kiriza dawi bi girtina Serdozgerê Komarê yê Erzinganê İlhan Cihaner dest pê kir û her ku diçê kûrtir dibe.

Do Serdozgerê Erzinganê İlhan Cihaner, li ser daxwaza dozgerê Erzeromê bi ithama endametiya rîexistina Ercenekonê hate girtin û tewqîfîkirin. Pişti vê girtinê, Heyeta Bilind ya Dozger û Dadweran (HSYK) reaksiyeonek mezin nişanî vê girtinê da û ew ji bi lez û bez civiyan. Di vê civinê da icar ji Heyeta Dozger û Dadweran (HSYK) bi bîrîyekê dozgerê Erzeromê û 4 alikarên wi ji wezîfî girtin.

Li ser vê bîryara HSYK-ê ji do da ye wezîre edaletê, serokwezir, serokê meclisê, serokkomar Abdullah Gul û hemû giregirêne AKP-ê û hemû endam û serokên Heyeta Dozger û Dadweran ketine pêxila hev û hevûdu bi gelek gotinên giran itham û tawanbar dîkin. Meriv dikane bibêje ku hukûmeta AKP-ê rûbirûyi krizeke pir mezin e. Û ev kiriz dikane AKP-ê perce bike, heta ji ser hukum da bixe. Çimki muxalefet ji dixwaze ji vê fersendê feydê bigre.

Loma ji cepheya li hember hukûmetê hineki firehtir büye, berê CHP, MHP û leşker bûn, nuha erka dadweriyê ji li vê cepheye zêde bû. Ev yek ji karê hukûmetê zahmettir dîke.

Û ev ne bes e, di ser da kurd ji li diji hukûmetê ne. Béguman ev yek ji karê hukûmetê zahmettir dîke.

Lê di vê şela kurdan da súc ya hukûmetê ye, hukûmet bi êriş û terora xwe ya li hember BDP-ê hêzeke pir mezin dike dijminê xwe. Hukûmetê heta nuha bi erka dadweriyê û artêşê ra tim riya pişopiso û lihevîkirinê hilbijart, tu cari bi cesaret neçû ser súc û bêqanûnîtiyê. Lê ev rîne rîyeke rast û saxlem e, dibê hukûmet dev ji vê siyaseta xwe ya oportunist berde.

Heger hukûmet ji iro û pêva vê cesaretê nişan nede ewê tûşî gelek gelşen mezintir bibe û bibe qurbana vê bêziraviya xwe.

Sonda Faşîzmê ya Rojane "Andimiz"

SERDAR BALCI

Di Peymana Mafen Zarakan a Navneteweyi de hatiye destnîşankirin ku tu kes û dewlet nikare zarokên ji 18 sali biçuktir bixe bin berpîrsiyariyan. (Bi vê ve girêdayî bi wan sondan bide xwarin.) Her wiha di xaleke din ji tê gotin ku bêyi destûra dê û bavê wan an ji berevajî ramanen wan zarok nayêne arastekirin û weki sedem ji té gotin ku ev helwest bandoreke neyini li ser pêşketina zarakan a psikolojik dike. Lê zarokên ku li Tirkîye dixwinin her roj sondeke nijadperest dixwinin.

SONDA XWENDEKARAN

Dr. Reşit Galip weki Wezirê Perwerdehiya Neteweyi beriya her tiştî ev sond bi zarokên xwe, paşê bi zarokên temenbiçük ên dibistanan daye xwarin.

Lijneya Hindekari û Perwerdehiyê ya Wezareta Perwerdehiyê ya Neteweyi, bi bîryara hejmara 101'ê ya mêjûya 10'ê gulana 1933'ye 'Sonda Xwendekaran' li gori vi wezirê birdoz ê tirk daye sepandin.

Li gori vê bîryara Lijneya Hindekari û Perwerdehiyê, di der barê "Sonda Xwendekaran" a ku her sibe xwendekar dubare bikin de Wezareta Perwerdehiyê ya Neteweyi di 18'ê Gulana 1933'ye de giştinameya bi hejmara 1749/42'ye weşandiye. Armanca 'Sonda Xwendekaran' û şêweyê gotinê di vê giştinameyê de hatiye daxuyandin.

Di 29'ê Tebax 1972'ye de û bi xala 78'emin a Rêziknameya Dibistanan Seretayi ya ku di Rojnameya Fermi ya bi hejmara 14291'ê hatiye weşandin de li 'Sonda Xwendekaran' ev besa dawin a li jér hatiye veserkirin:

"Tirk im, rast im, xebatkar im; rîzika min, parastina biçûkên min, rûmetdana mezinên min e, ji xwe pirtir ji welatê xwe, neteweya xwe hezkirin e. Mengiya min, mezinbûn, pêşveçûn e. Bila hebûna min ji hebûna tirk re diyari be."

- Her mamoste dê vê sondê di pola xwe de binivise ser depê, di lénûskên xwendekaran de ji bide nîvisandin û venêre (kontrol kirin) ku xwendekar vê sondê rast derbasî lénûskên xwe bikin.

- Mamoste dê sondê û ramanen ku derdibire, li gori astêni hişê zarakan bi zimanekî zindî û dîlkêş yeko vebêje, baldar be ku zarok wateya sondê baş tê bigîhîjin, gîringiyê bidê ku tu xaleke nefemkîrî nemine. Raman û derbiranen ku di sondê de derbasî dibin ên weki (tirkîti, rasti, xebatkarî, rîzika,

parastina biçûkan, rûmetdana mezinan, ji xwe pirtir ji welat û neteweya xwe hezkirin, mengî, mezinbûn, pêşveçûn, diyaribûna hebûna me ya ji hebûna tirk re) bi zarakan baş bide fîmkirin.

- Mamoste ji bo ku pêbawer be ka xwendekaran van raman û derbiranen fêm dîkin an na, di der barê her derbiran û ramanan de dê ji zarakan pîrsen têvel bike, tê bigîhîje ka van derbiranen li şuna xwe bi kar tînin an na dê bi xwendekaran hevokan bide sazkinin.

Seretayi ya di Kovara Danezan a Wezareta Perwerdehiyê ya Neteweyi ku Cotmeha 1997'ê û bi hejmara 2481'ê hatiye weşandin de hatiye destnîşankirin. Li gori vê xalê, xwendekar li dibistanen hindekari seretayi, beriya destpîkirina waneyan (ders) di bin qavdêriya mamosteyan de bi tevayî vê "Sonda Xwendekaran" a li jér dixwinin.

"Tirk im, rast im, xebatkar im.

Rîzika min, parastina biçûkên min, rûmetdana mezinên min e, ji xwe pirtir ji welatê xwe, neteweya xwe hezkirin e. Mengiya min, mezinbûn, pêşveçûn e. Ey Ataturkê mezin! Ez sond dixwim ku di riya ku te vekiriye de, bê rawestan bimeşime armanca ku te nişan daye.

Bila hebûna min, ji hebûna tirk re diyari be.

Çi dilşad e ew kesê ku bîbêje ez tirk im!"

DÊ HER ROJ BÊ DUBAREKIRIN

(Ji şêweyê léguncandina tirkî ya iroyin hatiye wergerandin)

Hejmar: 1749/42 18.5.1933

Li dibistanen seretayi, di her polê de, di dema tîketina waneyan pêşin de guncan hatiye ditin ku ji hêla zarakan ve xwarina "Sonda Xwendekaran" a tevde weki rîzika were pejirandin: "Tirk im, rast im, xebatkar im; rîzika min parastina biçûkên min, rûmetdana mezinên min e, ji xwe pirtir ji welatê xwe, neteweya (bûdun) xwe hezkirin e. Mengiya min, mezinbûn, pêşveçûn e. Bila hebûna min ji hebûna tirk re diyari be."

- Her mamoste dê vê sondê di pola xwe de binivise ser depê, di lénûskên xwendekaran de ji bide nîvisandin û venêre (kontrol kirin) ku xwendekar vê sondê rast derbasî lénûskên xwe bikin.

- Mamoste dê sondê û ramanen ku derdibire, li gori astêni hişê zarakan bi zimanekî zindî û dîlkêş yeko vebêje, baldar be ku zarok wateya sondê baş tê bigîhîjin, gîringiyê bidê ku tu xaleke nefemkîrî nemine. Raman û derbiranen ku di sondê de derbasî dibin ên weki (tirkîti, rasti, xebatkarî, rîzika,

parastina biçûkan, rûmetdana mezinan, ji xwe pirtir ji welat û neteweya xwe hezkirin, mengî, mezinbûn, pêşveçûn, diyaribûna hebûna me ya ji hebûna tirk re) bi zarakan baş bide fîmkirin.

- Mamoste ji bo ku pêbawer be ka xwendekaran van raman û derbiranen fêm dîkin an na, di der barê her derbiran û ramanan de dê ji zarakan pîrsen têvel bike, tê bigîhîje ka van derbiranen li şuna xwe bi kar tînin an na dê bi xwendekaran hevokan bide sazkinin.

"Bî darê zorê bi zarakan derewan dide kirin. Bo minak: Tirkbûn, rastbûn, xebatkarbûn û hwd."

"Mafê tu kesî tuneye ku jiyana njadekê ji bo njadeke din feda bike."

"Ji bili tîrkan gelên din ji hene, mafê wan ê xwezayî û gerdûni tê binpêkirin."

"Di vi welati de ji gelên din re oksijenê nahêle, wan difetisine."

"Dewlet be ji, ne xwendî wi mafî ye ku bi kesen ji 18 sali biçuktir sondê bide xwarin û her roj bi wan re peymaneke nû çêbîke."

"Bî darê zorê bi zarakan derewan dide kirin. Bo minak: Tirkbûn, rastbûn, xebatkarbûn û hwd."

"Mafê tu kesî tuneye ku jiyana njadekê ji bo njadeke din feda bike."

"Ji bili njade

Gelo Îran dest bi çêkirina sîlehêن nuklerî kir?

Xetera îranê ji bo gelên rojhilata navîn mezin dibe.

AMED (Pêşketin): Saziya Navnetweyeyî ya Atomê cara pêsi ragihand ku ew bi tirs û gümanin ku Iran dest bi çêkirina çêkén nuklerî kirin e. Di rapora ku serokê ajansa atomâ navnetewi Yûkya Amano şand jibo encümene asayısa NYî destnişan dike ku Iranê bi awakî serwer radeya dewlemendikirina úranyomê gihand %19,8 ê. Ligor raporê, Iranê ji bo ajasana atomâ navnetewi eşkerekir , ku bi aleta ezmongehî ya dewlemendikirina úranyomê li istgeha Natanzê ji roja 9 hetani 11 meha şibatê dikaribû radeya dewlemendikirina úranyomê bighine ji sedî 19,8ê.

Serekê ajansa atomâ navnetewi herweha tekiz dike ,ku di heman demê de ajansa atomâ navnetewi dikaribe kar û barên Iranê divi warî de kontrol bike da, ku bizanibe Iran jibo ci mewadêñ atomi bikartine . Iran li Dijj Israilê Soza Piştevaniya Dide Hizbullahê Serokê Irani Mehmed Ahmedinejad soz da ku Iran wê piştevaniya Hizbollah ya Lubnani bike, eger Israil disa érişê bike ser Hizbollah. Dezgehê ragihandinê ser bi dewleta Iranî li roja Pêncemê ragihand ku Ahmedinejad her wisa daxwaz li wê gruba çekdarî kir ku eger şer destpê kir, Israilê bi yek carî jinav bibe.. HAWAR NET.com



KURTE NÜÇEYÊN NAVNETEWEYÎ

Li Elmanyayê balafir li erdê man!

Şirketa heri mezin a firinê Lufthansa'yê de pilot dest bi greva kar berdanê kirin. Ji niha ve 3 hezar firin hate betal kirin. Wisa dixûye ku ji ber kar berdanê aloziyekê mezin derkeve holê. Tê diyar kirin ku nézi 4 hezar pilot tevli grevê dîbin. Armanca grevê zêde kirina muçeyan e..

Îran ber bi dîktatoriya eskerî ve diçe

Wezira derive yê DYE Hillary Clinton li paytexta Qetarê Doha'yê de daxûyanîyeke xwe de diyar kir ku li Iranê Parastvanê Şoreşê li şûna hikumeta Iranê digre. Clinton got; Li Iranê hikma hikumetê nemaye her tişt di destê leşkeran de ye"

Asya dibe navenda aboriyê

Piştî kriza abori ya cihani Asya cara yekem e, ku tê li ser xwe. Li Çinê baresta tevgera berhemdayina hundurin di sala 2009'an da bi 8 selefi ve bilind bû û tê pêşbinikirin, ku di sala 2010'an heta 10 selefan ve bilind bibe. Lé bendê ne, ku baresta tevgera berhemdarîya hundurin ya Hindistanê bigihije 7 selefan. Diyardeyên derbarê welatên din yên herêmê këmtir in, lê disa ji bi erêni ne. Ji bili wê ji, bi awayeka berbiçav para welatên Asyayê di nav bazirganiya cihanê da bilindtir dibe.

Rûsyâ ji berfireh bûna NATO nerazî ye

Sekretêre encümene asayısa Rûsyayı Nikolay Patruşev diyar kir ku berfirehkirina NATO xeteren mezin liser Rûsyâ saz dike . Patruşev diyar dike ku serkirdartiya NATO soz dabû ku hevpeymanê berfireh nekin , lê di destpêkê de 12 welat andamén NATO bûn niha jimara endaman bûye 28 welat . Patruşevher her wiha diyar kir ku welatên berê di hevpeymanîna Warso de bûn û hinek ji wan di nav Yekitti Sovyetê debûn iro bûne anadm di NATO de. HAWAR NET.com

Li Felestinê skandala seksê

Li Felestinê rojev dimenê seksê ya El Huseyni ye . Felestinê bi derketina kaseta seksê ya alikarê Mahmut Abbas'ê Refik El Huseyni'yê rojev serûbin bû. Di kaseta seksê de Refik El Hüseyni bi namzeteke ku serîena karê kiriye dikevê têkiliya cinsi. Dimenê han kete internetê ji. Nûce cara pêsi ji alyê televizyonke israilli ve hate dayin.

Çin li hemberî civîna Obama-Dalay Lama pir bi hêrs e

Çin bi hêrs e

Çin diyar diyar ku serdana rêberê dîni ya Tibetê bo Washingtonê wan eciz kiriye. Rêvebirya Pekinê ku Dalay Lama'yê wek "cûdaxwaz" binav dike ji ber hevditina wi abi Obamayê re gellek bi hêr bûye. Çin di daxûyanîya xwe ya derbarê ve mijarê diyar kir ku hevditin Dalay Lama û Obama dê bandoreke xirab ser têkilye Çin û DYE'yê bike. Çinê balyozê Amerika li Pekinê gazi li wezareta derveyê kir. HAWAR NET.com

HAWAR.NET.com

Yulia Timoşenko bi neçarî têkçûnê qebûl kir

Li Ukraynayê bi fermî hate ragihandin ku serkeftiyê hilbijarrina tura duyê ya 7'ê Reşemiyê ya Serokomariyê Serokê Partiya Herêman ê meydarê Rûsyayê, Viktor Yanukoviç e



KIEV: Serekwazira Ukraynaya Yulia Timoşenko pirsa xwe ya li dadgehê li diji hevrikê xwe, vekişa ú got: didtina rastiyê ne xema dadgehê ye. Tymoienko ev daxûyanîya supriz ne , dema li dadgehê li Kiev amade bû kir. Dûh ji gotibû heta dawiyê berê xwe bide tevaya belgenameyan liser helbijartinén serokatiya Ukrayna ku sextekari çêbûye. Bi ve daxûnaiya xwe rê li V. Yanukoviç vekir ku sonda serokariyê bikaribe bixwine ú édi bi avayeki fermî bibe serokê nû.. HAWAR NET.com

kurdistan
zanyarî
zaxo
amed
duhok
mîrdin
batman
hewlêr
sîne agirî xaneqîn
cizîr
arkomî elîn
wan
colemerg
mehebad
riha
qamîlo
silêmani
nûce
kerkük
idr
cihan
istenbo
paris
aku
aku
aktuel
zanist
ziman
bûyer teknoloji
çand
rojev
medya
şîrove

zanîn xwe nasîn e...

HAWAR NET
hawarnet.com

Xeyala DYE'yê li Polonyayê dibe rastî!

Plana DYE a bi cîh
kirina fuzeyên
Patriotê pêk tê

D.BEKIR (Pêşketin): DYE li gel itiraza
Rûsyayê li Polonyayê dest bi bi cih kirina
proje mertala fuzyan dike. Tê diyar kirin
ku besa pêsin a projeyê di nava 6 mehan de
dê pêk were.
Rûsyâ dijî planê derdiket lê rêvreibiriya
Obama bi guhertina hin xalén planê
Rûsyayê hinek be ji qanî kiriye. Bi cih
kirina fuzyan ji aliye parlementota
Polonyayê ve ji hate qebûl kirin.
Rûsyâ derbarê mijarê de got; eger em ji ji bo
xwe tehditek bibinin eme ji li cihê han
fuzyan bi cih bikin". HAWAR NET.com



Lêdanê Qemçîyan li Malezyayê

Di 9ê vê mehê (Sibatê) de 3 jî ber
têkiliyên seksuel bi mérän re lêdana
qemçîye xwarin. Ev búyer 17ê Sibatê de ji ali
Wezirê Navin hate eşkere kirin. Her sê jî li
girtigehêki néziki paytexta Malezyayê Kuala
Lumpur qewimi. 4 mér jî bi lêdanê
qemçîyan ceze sitendin. Lêdana bi qemçîyan
li Malezyayê bala Amnesty International
dikşine li ser xwe û li gori Amnesty,
penaber/mihacirên ku illegal dikevin
Malezyayê bi vê lêdanê ceze distin. Herweha dema penaber/mihacirên tiştên li
diji zagonê Malezyayê bikin, dîsa bi lêdana
qemçîyan û bi caran ceze distin. Di sala
2009, Heziranê, bi tevahî 47 914 penaber li
dadgehên Malezyayê ceze sitendin û 35 000
penaber ji sala 2002 û virde bi lêdanê
qemçîyan ceze sitendin.

Yewnanîstan kete bextê Ewrûpayê

YE biryara alîkariyê girt

ATINA: Serokên dewlet û hikumetên Yekitiya Ewrûpa biryara dan ku alîkariyê bidin
Yûnanistanê.
Wek tê zanîn Yewnanistan di nava krizeke mezin de ye. Doh di civina Serokên dewlet û
hikumetên Yekitiya Ewrûpa de biryara alîkari dayina li Yûnanistanê derket.

Li gor biryarê alîkari bo Yewnanistanê were dayin lê alîkari ne bêsinor be. YE dixaze
Yewnanistan tedbirên xûr verbigre û qerarên YE'yê bicîh binê. Wek tê zanîn hikûmeta
Yewnanistanê di çarçoveya paketa reforma aboriyê de her diçe nav li welatiyên xwe dişidîne.
Gel ji li dijî vê dest bi protesto û grevan kir. HAWAR NET.com

Li Tirkîye Kemalîst û Fettullahçî ketin qirika hev

AKP dema doza Şemzînanê de ji wezîfe girtina dozger
Sarikayê re bêdeng ma bû ni ha jî hawara demokrasiyê
dike...

QUDUS (Pêşketin): Serdozgerê Komarê yê Erzincanê İlhan Cihaner, bi idia "Endamîya réexistina
Ergenekonê", "Peywira xwe nebaş bikar aniyê" û "Gef tû bêbextiyê dike" hate girtin. Pişti Cihaner
hate girtin Lijneya Bilind a Dozger û Dadgeran (HSYK) rayeyên Cigirê Serdozger Tarik Gur, Dozger
Rasim Karakullukçu, Mehmet Yazıcı û Osman Şanal ên ku der barê Serdozgerê Erzinganê İlhan
Cihaner de lépisinê dan destpêkirin, betalkir. 4 dozgerên ku rayeyên wan hatin betalkirin, ji
Edliyea Erzeromê vejetian. HAWAR NET.com

JI BO ZEDETIR NÜÇEYEN NAVNETWEYI hawarnet.com

JI %92'Ê EMERİKAYÊ JI REWSA ABORIYÊ NERAZÎ NE

Xelkê Emerikayê ji ber rewşa aboriya
welatê xwe nerazî ne. Li encama anketa
televizyona ABC Newsê li Emerikayê nişan
dide ku nerazibûna xelkê Amerikayê ji ber
rewşa aboriye welatê xwe li hemberê sala
buhrû geleki zêde bûye.

Li gor vê anketê 92% xelkê Emerikayê
dema nirxandina rewşa aboriye welatê
xwe dibejin ku rewşa welet di vi wari de
ji mere fikaran çedike. Hatiye
ragihandin ku niha 9.7% xelkê
emerikayê ji bêkar in. HAWAR NET.com

Ebu Garipa Îngîlîzan jî derket holê

Wêneya ku leşkerên ingiliz eşkencayan li
girtiyen Iraqê dikin rojeva Îngîlîstanê
hêjand. Wêne di doza leşkerekî ku bi súca
êşkencê kîirinê dihat tawanbar kirin
derket.

Di wêneyê de tê ditin ku tiştên ku
leşkerên ingiliz kirine ne kêmî dimenê
li girtigeha Ebu Garip in. HAWAR NET.com

Di KURDO de
her tîst li ber
destê te ye...

Ename, sohbet, lîstik
nûçe, video, kîf, agahî
û zêdetir...



Li dijî lîderê Hamasê sûîqesta navneteweyî

Derket holê ku damezrinerê Tugayên Izedin El Qasam Mehmûd El Mabhouh ji aliye
koma ku 11 ajanên ingiliz, irlandi, fransiz û almanan pêk tê û yek ji wan jin e té de
cîh digirin ve hatiye kuştin. Mabhouh di damezrandina héza çekdar a Izedin El
Qasam de xwedî hêz û risteke esasi bû. Lépirsina sûîqesta li dijî El Mabhouh pêk hat ji
aliye polisên Dubaiyê ve hat destpêkirin. Polisê Dubaiyê derxist holê ku tima ku
sûîkast pêk aniyê û El Mabhouh kuştîye hemû ewropi ne û şefê yekîneyê ji fransi ye.
Mabhouh li Kampê Penaberan a Cebeliya Xeta Gazze yê hatiye dinê û roja 20'ê çileyê li
Dubaiyê di odaya otêlekê de bi awayekî kuştî hat ditin. Şefê Yekîneya Lépirsinê ya
polisên Dubaiyê Khalfan Tamim li ser mijarê got ku Hamasê ji wan re negotiye
damezrinerê Tugayên Izedin El Qasam bê parazvan seyhat dike. Tamim da zanîn ku
ji wan re bihata gotin dê wan parazvan bidanê û ew tu wateyê nadîn vê hismendiya
çawa dibe Mabhouh bê parazvan seyhat dike. Birayê Mahmud el Mebhous, Faik El-
Mebhous vedibêje ku şoqekî giran a ceriyanê dane serê birayê wî û birayê wî ji
gewriyê fetisandine. HAWAR NET.com

Zanist û Teknolojî

10 sedem ji bo spor kirinê....

AMED (Pêşketin)

Spor çima giring e, ji bo spor kirina 10 sedemén giring ewin;
 - Ji bo parastina forma bedenê û pêşî lê girtina qelew bûnê giring e.
 - Ji bo rehettir xwarinê spor pêwist e. Ger hûnê sporê bi avayekî rôkpek bikin ne lazim e ku hûn kaloriyên tiştên ku dixwin hesab bikin.
 - Spor mirovê ji gellek nexweşîyan diparêze. Weki nexweşîyen dil, diyabet, tansiyona bilind, zêdebûna kolestrolê...
 - Spor hestiyân xûrt dike. J bo ku dema pir bûnê de hestiyên we nehêlin sporê bikin.

- Ji bo ku masûlke (kas) ên we xûrt be sporê bikin.
 - Ji bo xûrt bûna bedenê. Ger sporê bikin hûnê derengtir westa bibin.
 - Ji bo şad bûnê spor bikin. Di dema spor kirin de hormonên ku mirovê şad dike té avzêkirin. - Xeweke baş. Spr kirin laşê rehettir dike û râ li baştar razanê vedike.
 - Ji bo aktif bûnê. Ger hûn sporê bikin, wê demen bi talûka de hûnê karibin çalaktir tevbigerin.
 - Ji bo ciwan mayinê. Spor kirin pir bûnê dereng dixe..



D.Bekîr di 3G de yekemîn e Heri zêde gelê Amedê 3G'ye eciband. Li gor daneyên şirketa Turkcell ku ku nû hate weşandin suprizeke balkeş derket holê. Li gor agahiyên ku Turkcell eşkere kiriye li Tirkîyê heri zêde axaftina bi dimen a bi riya 3G'ye li navçeya navendi ya Diyarbekirê navçeya Sûr'ê pêk hatîye Ev istatistikên dawî nişan didin ku heri zêde Kurd pêşketinê teknolojiyê diecibinin û zû hin dibin û bikartinin. HAWAR NET.com

Gelo Google dibe Kurdî?



AMED (Pêşketin): Li gor agahiyên ku hatine standin, bi paymaneke nepeni ku herdu ali ji veşartina wê berpirsiyar in, Google bi awayeki cidi û bi peyman dest bi kurdî dike. Xebat dê di sala 2010'an de bi tevahî were qedandin.

Di encama xebatê de beşen weki google légerin, google adsense, google adword, google earth, google chrome, webmaster tools, google analytics û hemû servisên din dé bi kurdî bêne vekirin. Ji bo hemû beşen 400 kesen ku baş bi kurdî dizanin, zimanê nivisbariyê yên weki ASP.NET, C/C++, python, MySQL, php, java, javascript, ajax, css û html dizanin, dé ji bo kar bêne girtin.

Torê sosyal pişta blogan sikand

Bandorê Facebook di her qadê de heye. Ji ber torê sosyal ên weki Facebook'ê bi taybeti ciwan ji blogan dûr dikevin. Li gor lêkolinekê li Emerikayê bikaranina blogan (rojiviskên internetê) di nava 3 salan de ji ber Facebook û Mayspace'ê %50 këmtir bû. Her wiha li gor lêkoline her çiqas navê Twitter di medyayê de pir derbas dibe ji di nava ciwanan de ne zêde navdar...

Wê heta 2050'an di jiyana me de ci bigûherin



AMED (Pêşketin): Di nava 40 salan de di jiyana me de wê ci bigûherin?...

Pêşbina tûnbînê ku ji aliyê Ross Doasonê ve ahtîye amade kîrin, tiştên ku ji 1950'an heta 2050'an winda bibin têne réz kîrin.

Dawson heman demê wê ci bikeve jiyana me ji ré dike. Li gorî Dawson tiştên ku ji jiyana me derkevin û bikevin wisa ne; Em ji we re listeya ji 2010 heta 2050 bi réz dîkin;

2010

Yên ku ji jiyana me derkevin: Nivisandina nameyan - Fikara hewayê ên di germâhiya nomral de - Veşartina şexsi - Xwelidank - Şirfiroş

Yên ku bikevin jiyana me: Komputerên wek cil - Makîna xewê - Ragihandina mobil a berfireh

2015

Yên ku ji jiyana me derkevin: Winda bûn - Nepeñiya şexsi - Xwelidank - Şirfiroş

Yên ku bikevin jiyana me: Cihêni niştecebûnê li ser heyvê - Erojname

2020

Yên ku ji jiyana me derkevin: Postaxane - Yên ku ji Şerê Cihana Yekemin rizgar bûne - CD - Rehberên telefonan - Teywana azad

Yên ku bikevin jiyana me: Emiliyatên ku ji aliyê robotan we tê çêkirin - Çavén çekiri - Tatilên li ezmanê dest pê dîkin

Em ji tiştîkî zêde bikin

Yên ku ji jiyana Kurdan derkevin: Dagirkîri - bindestî asimilasyon - otoasimilasyon - zimanê Tirkî

Yên ku bikevin jiyana me: Serxwebûna Kurdistanê - Yekitiya Kurdistan - zimanê Kurdi

2025

Yên ku ji jiyana me derkevin: Rastnivisin û imla - Kompiteren ser maseyê - Paris Hilton

Yên ku bikevin jiyana me: İstasyonên hidroejen jî bo erebeyan - Jê birina hişa mirov - İnterneta tegihêşer

2030

Yên ku ji jiyana me derkevin: Yekitiyên bazirgani - Baca mirasê

Yên ku bikevin jiyana me: Robotên xizmetkar - Erbeyên xwedî şoférên otomatik - Bakteriya sanal - Bi saya çipan hîn bûn wê rehettir be

2035

Yên ku ji jiyana me derkevin: Pereya madenî - Petrol - Microsoft - Banglades

Yên ku bikevin jiyana me: Riyên ku xwe bi xwe tamîr dîkin - diyetên li gor genan - Pencereyên rastşa sanal

2040

Yên ku ji jiyana me derkevin: Banknot ú cizdan - Motorên ku bi neftê dixwebitin - Kerrbûn - Pereya netewî - Gotina "min bibore" - Yekitiya Ewrûpa

Yên ku bikevin jiyana me: Febriqayênu ku li ezmanê bêne çêkirin - Pereya gerdûni - Kexizên diwarê ku dikarin dimen nişan bidin - Welatên ku tenê wek girtigeh têne bikaranin - Bi riya dermaneki dema xewê wê këmtir bibe

2045

Yên ku ji jiyana me derkevin: Ji dayik bûna normal - Qrevat - Monarşıya Engilizan

Yên ku bikevin jiyana me: Cila nepeñi bûnê - Li Marsê mirovên pêşî - Rojname û kovarên ser kaxiz - Xani bi temamî bibin elektronik û girêdayî kompiteran

2050

Yên ku ji jiyana me derkevin: Kor bûn - Google - Yên ku ji Şerê Cihana Duyemin rizgar bûne - Kanser - Gellek

nexweşîyen din - Aids - Klîten deriyan ên normal

Yên ku bikevin jiyana me: Robotên biçûk ên dikarin bi nexweşîyan re micadele bikin - Jiyana di cihanênu de - Neqla méjîyê - His bar kîrin - Tirûskandin (ışınlanma) - nasnameya gerdûni - Nîfusa cihanê dibe 10 mîyar - Dê herkes bibin xwedî erbeyên ku difirin - Di maçan de hekemên robot

Ü salêñ din de

Yên ku ji jiyana me derkevin: DYE - Çirkin bûn - Mirin

Yên ku bikevin jiyana me: Cîlênu asta stresê û nexweşîyan nişan dide - Madenvaniya ser kevirên ezmanê.. HAWAR NET.com

Robota herî "bi qebiliyet

Endezyarên NASA û General Motorsê robotên xwedî tiliyên pir hessas çekirin. Robotên bi navê Robonaut2 bi desten dikarin piraniya karên ku mirov dîkin, bikin. Robonaut2 ji bo febrikayan û ji bo xebatên li ezmanê tê pêxistin. Tiliyên robotan bi sensorên hessas hatine danin. NASA dixwaze bi zedetir pêxistinê Robonaut2 karibin li ezmnânanê karên bi xeter û gîring pêk binin e

Ji bo dilê xwe hay ji xwarinê xwe hebe!...

Li gor lêkolinekê moriv rojê pênc û zêdeyi dana fêki û giya û sewze bixwe ixtîmala derketina nexweşîyen dil ji sedi 25 kêm dîbe. Zanyarên ji Zanineha Londonê encama lêkolina xwe ya ku li ser 275 hezar kesen ji Ewropa, Japon û Welatên Yekirti yên Amerika kirine di kovarek Britani ya tenduristiyê de belav kîrin. Li gor lêkolinekê ku rojê sê an ji pênc dana mîye we û sewze dixwin bi wan re eşâ dil û ixtîmala sekinandina dilê wan ji sedi yazdeh kêm dîbe. Xwarina fêki û giya û sewzeyan ku rojê zêdeyi pênc dana be ixtîmala nexweşîna dil ji sedi 26 kêm dîbe. Li gorî lêkoline her dan divê 77 gram sewze û 80 gram ji mîye bê xwarin.

Apandîsit nexweşîyeke çawa ye?

Apandîsit bi iltehebbûna rûviyê kor, rûviyê zêde xwe nişan dide û nexweşîyeke pirr bi êş e. Hin nişaneyên wê

Tedawi

Heger apandîsit hatîye tesbitkirin, divê sedi sed di nava 48 seatê de were operasyonkirin. Pirrani terapi serkefti ye, radeya mirinê tenê 0,001 % e. Di operasyonê de rûviyê kor tê girtin. Weki tê zanîn rûviyê kor (zêde) bikêr nîne û jêkirina wê ziyanê nade organizmayê. Heger operasyonê li dûv xwe ti komplikasyon nehiştîye, nexweş dikare di demeke kurt de jiyana xwe weki berê bidomine

weşanên nûçe - rojname - tv - kovar - radyo

**Hemû linkên ji medyaya
Kurdî.**

**Cihê we yê
destpêkê!**

Bixwînin - Zîndî Temâse û Gûhdarı bikin
medyayakurdi.com



Çand û Hûner

Dilxwaziya Xwînê (Thirst)

AMED (Pêşketin)

Ji derhênerê filma OldBoy (Xortê Kal) filmeke tîrsdar a xwediyê xelata Cannes 2009 a jûriyê a taybet!...

'Ji bo kîyfa te dê çend kesen din bimirin"
Ji bo tedawiya nexweşîyeke bi xeter labaratiereke veşartî hatîye ava kirin. Derziya ku li hemberî virûsa Emmanuel hatîye pêşxistina ser hin kesan tê test kirin. Sang-hyun ji bo ku jiyana nexweşan rizgar bike tevlî ceribandinê dive.

Di nava 500 kesan de di dawiyê de ev sax dimine. Lê rastiya kes nizane heye. Sang-hyun bûye vampirek û labaratuvara ku ji boqenciyê çûye xwina mirovan vexwariye.

Ü dawiyê de ci be û Sang-hyun dê ci bike çawa rizagr bibe biçin di sinemayê de bibin şahid

Nasname

Dema nişandanî : 19 Şubat 2010


Derhêner: Chan-wook Park

Senaryo : Seo-Gyeong Jeong , Chan-wook Park

Çeker : 2009, Koreya başûr , 133 dq.

Listikvan

Kang-ho Song (Sang-hyeon) , Ok-bin Kim (Tae-ju) , Hae-sook Kim (Lady Ra) , Ha-kyun Shin (Kang-woo) , In-hwan Park (Papaz Noh). SINEMAKURD



Li Başûr 10 cd'yên Mihemed Şêxo hat derxistin

Enstituya Kelepûra Kurdi ku li başûrê Kurdistanê kar û bareñ xwe digerîne, di çarçoveya Zincireya Yadgariyan de albuma hunermend Mihemed Şêxo derxist ku ji 10 CD' an û 140 stranan pêk tê.

Stranên vê albumê ku bi serperiştiya Zeyneb Yaş û Hozan Emin hatîye amadekirin, bi teknikên nû hatine paqikirin û tevi jiyannameya Mihemed

Şêxo pêşkeşî dilxwaz û hogirê muzika kurdi hatine kirin.

Li aliyê din, Enstituya Kelepûra Kurdi her weha karê pirtûkekê dike ku li ser jîyan û hunera Mihemed Şêxo ye û stranên wî tevi notayê wan bi xwe ve digire.

Mihemed

Şêxo ku weki "Bavê Felek" jî tê naskirin, li hemi beşen Kurdistanê geriyaye û nav û deng daye û ji tevahiya çin û

birên civakê bengi û hogirê wî hene. Cihê birxistinê ye, Enstituya Kelepûra Kurdi ku li Silêmanî, Dihok û Kerkükê şaxên wê hene, di sala 2003'an de li Silêmaniye hate danin. Wê beriya niha jî albumên Hesen Zirek, Eli Merdan, Kawîs Axa, Mihemed Arif Cizîri, Mezher Xalîqi, Hesen Cizîri, Mihemedi Mamlê, Eyse Şan û Tehsin Taha derxistibûn. Her weha heta niha bi zimanê kurdi/kurmanciya jérin û jorin, kirdki, kelhûri, maçoyî 100 pirtûk li ser folklor û kelepûrê kurdi belav kirine. Jê pê ve wê li ser qereçiyê Kurdistanê, benîşte kurdi yê

Li devera Pişder, koçerên Qendilê û masigiriya li devera Qeladîze, devera Gulyan, Govendîn Çelê û Berwari Bala, Qale Mere belgefîlm durist kirine..

Li dû Tolhildanê (Edge Of Darkness)



Dedektifê maseya cinayetê Thomas Craven baveke ku bi tenê serê xwe keça xwe mezin dike ye. Keça wî ya 24 salî di dema mala xwe de tê kuştin herkes difikire ku hedef ne keça wî ye, hedef Thomas Craven bixwe ye. Lê Craven ji rewşê gûman dike û biryar dide ku mirina

keça xwe bikole. Lekolin wî dibe karên veşartî ên dewletê û jiyana veşartî ya keça xwe. Ü wî dibe Darius Jedburgh'ê. Film ji aliyê rexnegirê sinemayê hate ecibandin, biryara dawî ya we ye.... Listikavnê sererke listikavanê navdar Mel Gibson e. SINEMAKURD

Mîtolojiya Yûnanî Bi Kurdî Bû Roman

AMED (Pêşketin): Bibêje xwedayê, bibêje, ka hineki li ser Kassandra ji bibêje. Ka "bibêje xwedayê, bibêje, xişma Akhilleusê Peleus bibêje" gera qedere, fitla felekê û çiroka tekçuna evina Kassandra ji bibêje.


...Çün, lê çiroka wan, a şerê li ser Helena Spehi li binya diwarê bajare Troya, a egidiya Akhilleus, Hektor, Aeneas û hemû egidên din, a hişmendiya Odysseus ket ser zimanen. Her yeki çû çirok û serpêhatiya xwe, a şerê ku deh salan li ber deriyê bajarê navdar kiribû, a rîwitiya xwe û xezeba xwedan ji xelkê xwe re got. Bi baldarî û meraq li wan hat guhdarkirin. Bawerî ew bû ku wê tu caran jê tê nebûna...

Vê kitêbê mijara xwe ji Ilyada wergirtiye. Nav, cî û bûyerên di kitêbê de hatine nivîsandin û bikaranin hemû, li gora mitolojiya yûnanî ne. Silêman Demir, çiroka xwedayê yûnanî bi kurdi ji nû ve vedibêje.

Silêman Demir

Di sala 1956an de li gundeki Nisêbinê çêbûye û li Nisêbinê mezin bûye. Xwendina xwe ya heta lise li wir û jê pê ve ji Eğitim Enstitusu li Mêrdinê kiriye. Di 29 saliya xwe de, 1985an çûye Swêdê û ji wi çaxi ve li wir diji, dînivise û kar dike. Sé romanên wi derketine. Sorê Gulê (1997), Koç (1998), Pişti Bist Salan (2007).

Klîba nû ya Rihanna hate hez kirin



AMED (Pêşketin): Stranbeja Emerika Rihanna bi klîba xwe ya dawî cihan muzika DYE hejand.

Kliop di tv'yen muzikê klîbaka heri zêd e tê xwestin bû her wiha klîp ser You Tubê de jî di hefteyekê de 4 milyon car hate temaşe kirin. Ji bo temaşe kirina klîbê biçin ..MUZIKKURD.com'ê

Elîsa dixwaze careke din were Hewlêrê



HEWLÉR (Pêşketin): Stranbêja libnanî ya navdar Elisa, piştî pêşkêşkirina konsertekê li Hewlêrê, got ew dixwaze careke din biçe li Kurdistanê konsertekê bide. Elisa roja Şemîyê vegeriya Libnanê. Di dema vegerê de got, kîfa wê geleki ji Hewlêrê re hat û ew amade ye careke din

were li Kurdistanê konsertê bike. Elisa bi germî li Hewlêrê hate pêşwazikirin, berpirsiyare pêwendiyên derive di hikûmeta Kurdistanê de Felah Mistefa bi xwe çûbu pêşwaziya wê. Elisa roja inê li Hewlêrê konsertek da û têde zêdetiri 2000 kes amade bûn.

Welatê ku nebûye bindest; Etiyopya

Ciranên Etiyopyayê; Sûdan, Eritre, Cibûti, Somali, Kenya û Ûganda ne. Eritre berê perçeyek ji Etiyopyayê bû lê belê piştî referandûma 1993'an ji Etiyopyayê vejetiya û bû welatek serbixwe. Etiyopya yek ji welatên heri kevn ên serbixwe ye. ji xeyni dagirkirîya İtalyayê ya di navbera salen 1936-1941 de, di diroka xwe de ticarî nebûye welateki bindest. Ji du dezar sali zêdetir e ku serbixwe ye. Bilalé Habeşî yê ku yek ji misilmanên yekemin e û navê wî di diroka İslamiyetê de derbas dibe, ji vi welati ye.

Tîma Zaxo li hemberî Pîrs bi ser ket

ZAXO (Pêşketin): Di çarçoveya gera 9'ê ya dewra yekê ya liga futbola Iraqê li girûba bakur, tîma Zaxo bi encama 1-0 li hemberî tîma Pîrs bi ser ket. xuli iraq, yanai zaxo Gogbazên her du timan bi dirêjîya listikê de asteke baş pêşkêş kirin û metîrsî bo ser hevdu pêkanîn lê di encam de dewra yekê bê avêtina tu golekê bi dawî hat. Di dewra duyê de û piştî derbasbûna 17 deqeyan, gogbazê tîma Zaxo Salih Cabir gola yekê bo tîma xwe avêt. Piştî vê golê gogbazên tîma Pîrs tev şiyana xwe xistin rojevê bo avêtina gola yeksanbûnê, lê di dawiyê de listik bi vê encamê bi dawî hat.

Dîroka nêz a Kurdistanê di meha Sibatê

Kovara Rewşen dest bi weşanê kir
01 Sibat 1992

Rexistina Azadi hate avakirin
08 Sibat 1925

Cemal Baban kovara Bangî Kurd derxist
08 Sibat 1914

Lice ket hêzên Şêx Saidê
10 Sibat 1925

Li başûrê Kurdistanê Yekitiya Niviskarêne Kurd
hate ava kîrin.
10 Sibat 1925

Mele Mistefa Barzanî rexistinek bi navê Azadi ava
kir
12 Sibat 1945

Helbestvanê navdar Hêjar cû ser heqîya xwe
21 Sibat 1991

Li başûrê Kurdistanê "Meşa Dirêj" destpêkir
22 Sibat 1947

Rojnameya Welat dest bi weşanê kir
22 Sibat 1992

Nasname:
Rojnameya Pêşketin – Versiyona çapkirî ya HAWAR NET.com'ê
Çapa Dijital
Xwedî û berpirsyarê giştî: Serhad B.RÈNAS
Gêrinmendeyê Giştî-Editor: Mihemed ZERAK
Navnîşana webê: www.hawarnet.com / Têkîlî : agahi@hawarnet.com
Pêşketin weşanekê Hawar Kurdistan Media Group e. Dezgehtî: www.hk-mg.net
Hawar Kurdistan Media Group e. Dezgehtî: www.hk-mg.net
Hawar Kurdistan Media Group e. Dezgehtî: www.hk-mg.net
Hawar Kurdistan Media Group e. Dezgehtî: www.hk-mg.net

Telefona herî erzan: bi 11 dolara derket...

Li Barcelona, füara Mobile World Congress (Komicivina Cihanê ya Mobil) hebû, ku li vir telefonek hate nasandin. Vodafone, ev telefon bi idea ku li cihanê telefona herî erzane derxist. Modela Vodafone 150 bi 11 dolara û Vodafone 250 ji bi 20 dolari ye.



Gesture Cube 3D; Kupa teknolojiyê

Bi vê amûrê dibe ku teknolojiya 3D bi temamî bikeve jiyana mirovan..

AMED (Pêşketin): 3 şirketa elmanî hatin cem hev û amûreke xwedî teknolojiya bilind afirandin. Gesture Cube 3D xwedî sê rû ye. Dikare herketên bedena me pêhese. Xwedî ekranenê têgiheştina otomatik e. Mirov nikare bêje destdanmatik e ji ber ku beyî ku hûn dest

bidin ser ekranê hereketên desten we fam dike. Bi saya vê kupê tv tê temaşe kîrin, malper têne vekirin, muzik dikare bê guhdari kîrin, dosyeyen di kompîter û di telefonen we de dikare bê nişandan. Derbarê amûrê de zêdetir agahî nine.

Li Amedê Konferansa Sporê dest pê dike


AMED (Pêşketin): Konferansa Werziyê bi alikariya tevâhiya civata werziyê û di bin banê kordinatoriya Diskisporê yekeyen pişgirên werziyê yê li Diyarbekirê hat lidarxistin. Konferansa ku wê kesen wek zanist, nivîskar û civata werziyê bigihîjin hev cara yekem pêk tê..... Diyarbekir ku navê xwe bi mihrican, fûar, komê xebatên û sempozyûman dayebihîtin îcar jî ji bo mazûvaniya kesen giring ên civata werziyê amadekariyê dike.

Konferansa werziyê ku berê qet li Tirkîyeyê nehatiye ceribandin dê li Diyarbekirê bê lidarxistin Bi beşdariya Diskisporê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, Werziyâ Diyarbekirê û yekeyen aligirên werziyê li bajêr wê di roja 23-24'ê Sibatê de bê lidarxistin, bernameya konferansê bi civîna çapmeniyê hat ragihandin. Kilavûz da zanîn ku ew di civîna meha berfanbarê de bi civata werziyê re hatine cem hev û mijarên konferansê diyar kîrin e û bibîxist ku dê kesen di kadên xwe de pispor in beşdar bibin.

Sedema maqyaj kirina jinan heye

Depresyon, xemgini, ziravcani, kelin û keserkişandineka kûr e. Hestên mirov ziravcani bûye, mirov ketiye xemginiye kûr. Heger depresyon negîhiştibe asta klinik, ango nebûbe klinik depresyon normal e. Di navâ gel de bêhna kê teng dibe, jê re bi şashi dibêjin "ketiye depresyonê".

Rast e, depresyon bêhntengibûn e, lê bêhntengibûneke dirêj e û hin taybetiyen wê hene. Bo minak melankoli hergav tevli depresyonê ye. Gelek sedemên depresyonê hene. Depsesyon destpêka gellek nexweşîyen psikolojik e.



EGER TU KURD Î...

Ü TU HAXWAZÎ BIODEST BIMIN, TU HAXWAZÎ ZİMANE KURDI Ü MİLLETÊ KURD TUNE BİGIN...

BI DAXWAZNAMEYAN, BI MEŞAN, BI BOYKOTAN, BI ÇALAKIYAN, BI NEÇÜNA DIBISTAN Ü KARGEHÊ, BI DOZ VEKIRİNÊ...

PERWERDEYA BI KURDİ BIXWAZE!

Jİ BO REKLAM Ü ÏLANÊN WE

Hün dikarin di Pêşketin, HAWAR NET.com an jî weşanên din ên koma HAWAR de reklam û ïlanên xwe bi nirxa herî gûncaw biweşînin.

tekîlî agahi@hawarnet.com